



TÊ KOSER



HEJMAR 38

KANUN 1987



revue trimestrielle

N° 38

driemaandelijks blad

TEKOŞER: KOVARA TEKOŞER, YEKİTİYA KARKER Ü XWENDEKAREN KURD LI BELÇİKA

NAVNIŞAN: rue BONNEELS, 4 - 1030 BRUXELLES - BELGIQUE

TEL: 02/230.89.30

NAVNIŞANA POSTE: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 50 F.B.

Nº BANKE: 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezih YALÇIN

KOMİTA NIVISKARIYƏ: Ahmed, Derwəş, Pervin, Yalçın

N A V E R O K

HEFTEYA DUYEM LI SER ZIMANÉ KURDİ, LI BARSELONA	Derwəş	P. 3
PIRSA KURDİ LI PARLAMANA EWROPA		P. 4
RÉZIMANA KURDİ (XI), PAREK	Celadet BEDIR XAN û Roger LESCOT	P. 6
HELBESTEN XWENDEVANAN	Sebrî BOTANI, Amed, TORİ	P.10
KURTEÇTROK: SED Ü YEK AL Ü ALEKE	Şahînê Bekirê SOREKLÎ	P.12
WEŞANEN NUH: Nêrgiza TORİ, Ş. B. SOREKLÎ, A. NEKŞEBENDİ, Firat CEWERİ		P.13
DİROKA KURDISTANE DI ANSİKLOPEDIYA ISLAME DE (XI), Civaka kurdî (2)		P.14
BELÇİKADA GENEL SEÇİM	Ahmed	P.18
WENEYEN ZAROKAN		P.20
FERA KURDİ: 1, 2		P.22
XEBATA ME		P.24
TEKOŞER'DEN HABERLER		P.26

S O M M A I R E

DEUXIEME SEMAINE D'ETUDE SUR LA LANGUE KURDE, A BARCELONE	Derwəş	P. 3
LA QUESTION KURDE AU PARLEMENT EUROPEEN		P. 4
GRAMMAIRE KURDE (XI), LES PARTICULES	C. BEDIR XAN et R. LESCOT	P. 6
POEMES DES LECTEURS	Sebrî BOTANI, Amed, TORİ	P.10
CONTE: CENT ET UN DRAPEAUX	Şahînê B. SOREKLÎ	P.12
NOUVELLES PUBLICATIONS: Nêrgiza TORİ, Ş. B. SOREKLÎ, A. NEKŞEBENDİ, F. CEWERİ		P.13
L'HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM (XI), La société kurde (2) ..		P.14
ELECTIONS EN BELGIQUE	Ahmed	P.18
DESSINS D'ENFANTS		P.20
COURS DE KURDE		P.22
NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES		P.24

I N H O U D

TWEEDIE STUDIEWEEK OVER DE KOERDISCHE TAAL, TE BARCELONE	Derwəş	P. 3
DE KOERDISCHE KWESTIE IN HET EUROPEES PARLEMENT		P. 4
KOERDISCHE GRAMMATICA (XI), DE VOOR- EN ACHTERVOEGSELS	C. BEDIR XAN en R. LESCOT	P. 6
GEDICHTEN VAN LEZERS	Sebrî BOTANI, Amed, TORİ	P.10
VERHAAL: HONDERD EN EEN VLAGGEN	Şahînê B. SOREKLÎ	P.12
NIEUWE PUBLICATIES: Nêrgiza TORİ, Ş. B. SOREKLÎ, A. NEKŞEBENDİ, F. CEWERİ		P.13
DE GESCHIEDENIS VAN KOERDISTAN IN DE ENCYCLOPEDIE VAN DE ISLAM (XI), De Koerdische Maatschappij (2) ..		P.14
VERKIEZINGEN IN BELGIE	Ahmed	P.18
KINDERTEKENINGEN		P.20
KOERDISCHE LES		P.22
ONZE DRIEMAANDELIJKE ACTIVITEITEN		P.24

HEFTEYA DUYEM Lİ SER ZİMANÊ KURDİ

Dervêş

Nivîskar, rojnamevan û zimanzanê Kurduyem car li Barselona, paytextê Katalonya, civiyan û xebata rastnivisîna Kurmancî berdewam kir. Weka ku tê zanîn, ev xebat ji aliyê Enstituya Kurdî ya Parîsê tê amade kirin.

Civîna pêşîn ji 18 ta 24ê Nîsanê dom kiri bû. Encamên (netice) wê ji aliyê Enstituyê hatin weşandin: **Nexşeya Cihanê** û rojnameyeke taybetî (xusûsî) ya vê civînê bi navê "KURMANCÎ".

KURMANCÎ encamên her civînê bi awakî baş digihîne xwendevanan. Ji pêşneyaran re vekirî û amade ye.

Civîna duyem a Barselona ji 7 ta 14ê Mijdar (Teşrîn) dom kir. Ji hemî welatên Ewropa nûner hebûn. Kurdên ji navçeyên cida yên Kurdistanê xebata xwe dom kir.

Di civînê de ev kes besdar bûn: Kendal, Izolî, R. Barnas, Reşo, M. Yetkin, Musa, Hiner, Xosrow, M. Uzun, F. Cewerî, Derwêş.

Di civînê de xebata ji bo nexşeya Kurdistanê li ser rastnivisîna navê welayet, çiya, çem, gund, qeza, golên parçeyên Kurdistanê, terminolojiya siyasi û idarî, reng, meyve (fêkî), şînayî (sebze), wesayet û hwd. çêbû.

Roja dawîn bernama civîna sêyem ku ewê li Beljîka çêbibe hat tesbit kirin. Di civîna sêyem de ewê li ser rastnivisîna navê weka istikamet, anatomiya serî, terminolojiya rojnamevanî û idarî, navê kulîlk, teyrik, masî û beharatan xebat bibe.

Paş ku civîna duyem li Barselona qediya, hemî besdarên civînê ji aliyê serekwezîre Katalonya hatin vaxwendin (ezimandin) û ew gün serdana (ziyaret) wî. Paş ku heyetê ser da serekwezîr û nexşeya cihanê ku yekem car e çap bûye diyarî wî kir, serekwezîr daxwazî û hêviyên xwe ji bo gelê Kurd kirin û da zanîn ku ew piştgiriya standina mafêñ gelê Kurd dike.

**NEXŞEYA SIYASİ
YA CİHANE**

PIRSA KURDÎ LI PARLAMANA EWROPA

Di mîjuya (tarîx) 6 Nîsan 1987 de, kommisyonârêzanî (siyasi) ya Parlamanâ Ewropa pêşneyara van parlamanterên ku ji netewahî (cinsiyet) û partiyêni cihê ne: ULRBURGHS, BOESMANS, KUIPERS, PANNELLA, CICCIONESSERE, BONINO, Van der LEK, HEINRICH, STAES, TRIDENTE, BANDRES MOLLET, BLOCH von BLOTTINITZ, van DIJK û von NOSTITZ, li ser sirgûn-kirina bi hezaran ji gundiyêne Rojavaya Bakurê Kurdistanê, pejirand (qebûl kir) û ji hikûmeta Tirkîyê, Wezîrên Karêne Derveyî yên Ewropî û heyetêne bilind ên ewropî re bangekî şand.

Em li jêr metnê vê biryarê weka xwe diweşînin.

FR



Communautés Européennes

PARLEMENT EUROPÉEN

DOCUMENTS DE SEANCE

Edition en langue française

1987–88

6 avril 1987

SERIE B

DOCUMENT B2-152/87

PROPOSITION DE RESOLUTION

déposée par MM. ULRBURGHS, BOESMANS, KUIPERS, PANNELLA, CICCIONESSERE, Mme BONINO, M. Van der LEK, Mme HEINRICH, MM. STAES, TRIDENTE, BANDRES MOLLET, Mmes BLOCH von BLOTTINITZ et van DIJK, M. von NOSTITZ

conformément à l'article 47 du règlement

sur la déportation de milliers de villageois du Nord-Ouest du Kurdistan

Le Parlement européen ,

- A. vu l'information parue dans le journal turc Cumhuriyet du 15.2.1987 selon laquelle la moitié des villages du Tunceli seront déplacés vers les régions de Mersin, Antalya, Mugla et Izmir, soit 234 villages du Tunceli , dans lesquels vivent au total 50.000 habitants qui attendent la date précise à laquelle ils devront quitter la région ,
- B. vu d'autres informations selon lesquelles les provinces de Tunceli , Erzincan, Erzurum, Kars, au Nord-Ouest du Kurdistan, seraient particulièrement touchées et totalement dépeuplées,
- C. vu que des tentatives similaires ont déjà eu lieu dans le passé telles que la loi n°2510 du 21 juillet 1934 relative au banissement, aux termes de laquelle des régions où des Kurdes vivaient depuis près de 2.000 ans ont dû être évacuées,
- D. vu la réaction de panique qui a surtout gagné la population kurde intéressée, laquelle craint de disparaître en tant que peuple en raison de cet exode massif en Turquie occidentale, conjugué à d'autres mesures de répression, telles que l'interdiction de la langue kurde,
 - 1. demande au gouvernement turc des éclaircissements sur ces nouvelles rumeurs de déportation et condamne vigoureusement l'éventuel recours à la force qui pourrait impliquer cette opération ;
 - 2. demande aux ministres des Affaires étrangères réunis dans le cadre de la coopération politique d'intervenir auprès du gouvernement turc pour empêcher cette nouvelle tragédie frappant le peuple kurde ;
 - 3. charge son Président de transmettre la présente résolution au Conseil, à la Commission, aux ministres des Affaires étrangères des Etats membres ainsi qu'au gouvernement turc.

RÊZİMANA KURDÎ

(Z a r a v ê K u r m a n c î)

- XI -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (*)

II. P A R E K PAREKA DESTNÎŞANDANË

98. Berê ku em dest bi lêhûrnêrîna parekan bikin, pêwist e ku em van her du rêzikan (qaide) nas bikin:

1) Her navekî kurdî di rewşa mutlaq de binavkirî ye (1).

Nîşe: Hesp, mehîn, mal.

2) Di piraniya rewşan de, nav tê pêşıya rengdêr (sifet) yan têrker.

Nîşe: Mala spî, destê min.

Emê navê parek bidin hin regezên (unsur) ku bi nav re tê ragihandin, ji bo ku hinek hûrbûn û firehbûna rêzayê (manâ) wî yê di rewşa mutlaq de biguherînin. Parek ji bo nîsandana van rewşan bi kar tê:

a) Yan nav binavkirî dimîne û bi ser de jî bi gotineke din tê dest nîşan dan (pareka destnîşandanê).

Nîşe: Hesp-ê Soro.

b) Yan jî ew di rewşa nebinavkirî de ye (pareka nebinavkirinê).

Nîşe: Hesp-ek.

99. Pareka destnîşandanê

Pareka destnîşandanê ji bo nîsandana pêwendiya ku di navbera navekî ku di rewşa mutlaq de ye (ango binavkirî) û her regezekî (rengdêr, nav, pronav "zemîr", tofeke "kom, grûp" gotinan) ku di eynî zemanî de wî dest nîşan dide û di paş wî de tê de ye bi kar tê. Parek li dawiya gotina destnîşandayî tê danîn û pê re yek dibe. Li gora zayend (cins) û jimarnava gotina ku parek digihêje wê, ew van teşeyan (awa) distîne:



(*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Parîs 1970. Wergerandin, fransizî-kurdî: Pervîn.

(1) Bi "rewşa mutlaq" em dixwazin bêjin rewşa ku tê de nav bi tu parek yan bi tu pêkşke-reke awayî ne hatiye ragihandin. Divê ku ev "rewşa mutlaq" û "avahiya mutlaq" ku em di zimanine din de dibînin neyên tev li hev kirin.

Bi ser de jî, ji bo ku em vekirîtir bin, em diviyan ji hergav bêtir cihêtiyekê di navbera rêzayê (manâ) gotinê "binavkirî", "binavkirin", "destnîşandayî", "destnîşandan" û hwd. bikin. Em "binavkirî" ji her gotineke ku rêzayê wê weka yê fransizî ye "défini", ku vegetandeka binavkirinê (le, la, les) tê pêşıya wê, dibêjin; "nebinavkirî", ji her navekî ku, weka di fransizî de "indéfini", li pêşıya wî yek ji vegetandekên nebinavkirî (un, une, des) tê; "destnîşandayî: déterminé", ji gotineke ku li pasiya wê rengdêrek (sifet) yan têrkerek tê dibêjin.

- ê, ji bo nêrê yekejmar.
- a, ji bo mîya yekejmar.
- ên, ji bo gelejmara her du zayendan.

1º Nêrê yekejmar

Bi navên: Hesp, nan, goşt, dar, kon, emê van teşeyan bibînin:

- a) Navê ku bi rengdêrekê hatiye dest nîşan dan:

Hespê boz.

Nanê hişk.

Goştê sor.

Darê stûr.

Konê res.

- b) Navê ku bi navekî hatiye dest nîşan dan:

Hespê Soro.

Nanê tenûrê.

Goştê golikan.

Darê şivên.

Konê aixê.

- c) Navê ku bi pronavekî hatiye dest nîşan dan:

Hespê min.

Nanê te.

Goştê wî.

Darê me.

Konê we.

Hespê wan.

2º Mîya yekejmar

Emê weka nîşe navên: Mehîn, şev, kîr, av, dar, mirîşk bistînin:

- a) Navê ku bi rengdêrekê hatiye dest nîşan dan:

Mehîn qenc.

Şeva sar.

Kîr piçûk.

Ava germ.

Dara heşîn.


Mirîşka qelew.

- b) Navê ku bi navekî hatiye dest nîşan dan:

Mehîn Soro.

Şeva baranê.

Kîr pola.



M. EMİN BOZARSLAN

Ava çem.

Dara gund.

Mirîşka pîrê.

- c) Navê ku bi pronavekî hatiye dest nîşan dan.

Mehîn min.

Şeva te.

Kîr wî.

Ava me.

Dara we.

Mirîşka wan.

3º Gelejmara her du zayendan

Navên nîr: Hesp, nan, dar û navên mî: Mehîn, kîr, av, van teşeyan didin:

- a) Navê ku bi rengdêrekê hatiye dest nîşan dan:

Hespê boz.

Nanê hişk.

Darê stûr.

Mehînê qenc.

Kîr mezin.

Avê sar.

- b) Navê ku bi navekî hatiye dest nîşan dan:

Hespê Soro.

Nanê tenûrê.

Darê Şivên.

Mehînê Soro.

Avê Kurdistanê.

Kîr pola.

c) Navê ku bi pronavekî hatiye dest nîşan dan:

Hespên min, te, wî, me, we, wan.

Mehînên min, te, wî û hwd.

Nîşank: Di peyva rojî de, "n'a pareka gelejmar gelek dikeve, loma teşeyen: hespê

min, mehînê min, û hwd., dêlva hespên min, mehînên min, û hwd.

Pêsgotî: Rê reya mirinê be jî, tu her li pêş be.

MANUEL DE KURDE

(dialecte Sorani)

Grammaire, textes de lecture, vocabulaire
kurde - français et français - kurde

JOYCE BLAU

1980
Diffusion

LIBRAIRIE C. KLINCKSIECK
PARIS

TRAVAUX DE L'INSTITUT D'ETUDES IRANIENNES
DE L'UNIVERSITÉ DE LA SORBONNE NOUVELLE

8

JOYCE BLAU

chargée de cours à l'Institut National des Langues et Civilisations Orientales

LE KURDE DE 'AMÂDIYA ET DE DJABAL SINDJÂR

Analyse linguistique,
textes folkloriques, glossaires

III. P A R E K

PAREKA NEBINAVKIRINÊ

100. Navê binavkirî yê di rewşa mutlaq de (li bend 98 binêre) dikare bibe nebinavkirî bi ragihandina parekeke ku jê re pareka nebinavkirinê tê gotin: "-ek" ji bo nêrê û mîya yekejmar; "-in" ji bo gelejmara her du zayandan.

Bi navên nêr hesp, nan, dar û bi navên mî şev, kîr, av, emê vana bibînî:

Hespek	Hespin
Nanek	Nanin
Darek	Darin
Mehînek	Mehînin
Şevez	Şevin
Kêrek	Kêrin
Avek	Avin

101. Dibe ku navê di rewşa nebinavkirî de bi têrkerekê yan bi rengdêrekê hinek bê dest nîşan dan. Wê gavê, pareka nebinavkirinê van teşeyan distîne:

-ekî, ji bo nêrê yekejmar.

-eke, ji bo mîya yekejmar.

-ine, ji bo gelejmara her du zayandan.

1° Nêrê yekejmar

Emê nîşeyen pişka (fesl) buhurî bistînin: Hesp, nan, goşt, dar, kon.

a) Navê di rewşa nebinavkirî de, lê ku bi rengdêrekê hatiye dest nîşan dan.

Hespekî boz.

Nanekî hişk.

Goştekî sor.

Darekî stûr.

Konekî reş.

b) Navê di rewşa nebinavkirî de, lê ku bi navekî hatiye dest nîşan dan:

Hespekî Soro.

Nanekî tenûrê.

Goştekî golikan.

Darekî şivên.

Konekî koçeran.

c) Navê di rewşa nebinavkirî de, lê ku bi pronavekî hatiye dest nîşan dan:

Hespekî min, te, wî.

Hespekî me, we, wan.

2º Mêya yekejmar

Emê cardin nîseyên pişka buhuri
bihêlin: Mehîn, şev, kêr, av, dar,
mirîşk.

a) Navê di rewşa nebinavkirî de, lê ku
bi rengderekê hatiye dest nîşan dan:

Mehîneke qenc.

Şeveke sar.

Kêreke piçûk.

Dareke mezin.

Mirîşkeke res.

b) Navê di rewşa nebinavkirî de, lê ku
bi navekî hatiye dest nîşan dan:

Mehîneke Soro.

Şeveke baranê.

Kêreke pola.

Aveke çeman.

Dareke aixê.

Mirîşkeke pîrê.

c) Navê ku bi pronavekî hatiye dest
nîşan dan:

Mehîneke min, te, wî, me, we, wan.

3º Gelejmara her du zayandan

Navê nêr hesp, dar, kon û navê
mê mehîn, mirîşk, kêr vana didin:

a) Destnîşandana bi rengderekê:

Hespine boz.

Darine stûr.

Konine res.

Mehînine qenc.

Mirîşkine spî.

Kêrine tûj.

b) Destnîşandana bi navekî:

Hespine Soro.

Darine Şivên.

Konine koçeran.

Mehînine Soro.

Mirîşkine aixê.

Kêrine pola.

c) Destnîşandana bi pronavekî:

Hespine min, te, wî, me, we, wan
û hwd.

Mehînine min, te û hwd.

NîŞANK. Di peyva rojî de, gelek caran meriv
dengdêra pareka nebinavkirinê ya yekejmar
bi lêv nake. Loma, ji bo nîseyên jorîn,
teseyen: Hespkt boz, nankt hisk, göstkti
sor, darkt stûr, konkt res, mehînke qenc,
şevke sar, kérke piçûk, darke mezin têr
bi kar anîn. Di "mirîşkeke res" de,
ketina "e" nayê pejirandin (qebûl kirin),
ji bo ku ewê bibe "mirîşk-ke res" û "mirîş-
ke res" bê bi lêv kirin. Jî bo ku Kurîd dû-
barebûna (tekrarbûn)du dengdaran tehemmûl
nake, ewê parek rabe. Ev nîşank ji bo hemî
gotinênu ku bi "k" diqedin dibe.

NEXŞEKE BIRANINÉ

YEKEJMAR

GELEJMAR

Nêr:

Hespek

Hespin

Mê:

Mehînek

Mehînin

Nêr:

Hespekî Soro

Hespine Soro

Mê:

Mehîneke Soro

Mehînine Soro

Pêşgotî: Mirov kuştiyê şêra bit, ne girtiyê roviya.

HELBESTÊN XWENDEVANAN

Stirana Gulbiharê

Sebrî BOTANI

Ji devê M. GUNAY

Kuriko dîno! Tengîkurt in ez bi gorî!
Ha ha te dî weke xewnek giran borî

Kuriko dîno! Xewna min tê tu nahêlî!
Çawa diğî welatê xerîbiyê û min dihêlî?

Çeto lawo! Şermê bike ji navê min!
Ji wê xwîna tête xwarê ji çavê min

Şirînê ber dilê mino! Xo bike ewrek reş û tarî!
Hûrik-hûrik bibarîne! Ser vî warî, li vî aqarî

Lo lo gidî! Were tu malxwê be ez kabanî!
Ala evîniyê dîsa hilde! Ser wî serî, li ser wî banî

Delalê dilê mino! Çenda bêjim hêj û wêve ye!
Were were! Şeql û hêla te pêve ye!

Gidî lo lo! Tu xoşmîrê min î! Ez dilbera te me!
Were bi şêxadî kesk û sor û zera te me!

Xoşî û tenahiyê bîne dîsa bo vê malê!
Bi derzîka min sêwîkê bixemline rengê alê!

Çeto lawo! Ez welat im! Ez welat im!
Lo lo gidî! Her nûjen im, tirh û kat im

Li zozanên evîna dila, bila helbin hezar çîra!
Di govenda min û te da, xo hilavêjin bab û bira!

Çeto lawo! Tu xoşmerek astîxwaz î!
Lê ku ne bû, bi xwînê jî min dixwazî!

Ey keça kurd

Ey kiça kurd! Ey kiça kurd!
Zû hilo derkev ji gov!
Lez bixwîne! Baş bibîne!
Da ne mînî nîvmirov!
Ma ne şerm e her bîmînî
bê amanc û bê dirov!
De hilo rabe delalê!
Tu nebî şîn nabit tov!
Bo tovê jîna welatî
bê guman her tu yî şovi

Beşîr S. Botanî



Stran

Helbest

Muzik

-1-

Nîşank: Ev helbest ji aliyê Komal Dîlo ji me re hatine şandin.

Dilê min ï liyan e

Amed

Rûyê gelê min ï gewre,
Rûresî gelekî nebû.
Zimanê gelê min ï şêrîne,
Tirş û tal nakim.
Wekîdinê, dilê min ï liyan e.

* * * *

Deriyê welatê min ï bilind e,
Nizim nakim.
Sivra gelê min a mezin e,
Biçük nakim.
Wekîdinê, dilê min ï liyan e.

* * * *

Sînorêñ welatê min pareke,
Parşe-parçe qebûl nakim.
Sîng û berê gelê min ï pîr ï pan e,
Tenik û zirav nakim.
Wekîdinê, dilê min ï liyan e.

* * * *

Bejna welatê min a çeleng e,
Kinik û hûrik nakim.
Koka gelê min a kevnar e,
Narize û wenda nabe.
Wekîdinê, dilê min ï liyan e.

* * * *

Deşta welatê min a kesk e,
Hişk û biring nabe.
Dengê gelê min ï zelal e,
Nakeve, genî nabe.
Wekîdinê, dilê min ï liyan e.

* * * *

Çiyayêñ welatê min her Newrozê a gesin,
Li hember mir-hovan hilnawesin.
Tamarêñ gelê min a şînin,
Çiqasî werin mêtin
Natixin û hişk nabin.
Wekîdinê, dilê min ï liyan e.

* * * *

Co û çemên welatê min a kûrin,
Çiqasî kolonîst jê vexwin
Namiçiqin, tenik nabin.
Bêna gelê min a firehe,
Kurt û teng nabe.
Wekîdinê, dilê min ï liyan e.

* * * *

Bist milyon sêwî Dewrêşê Evdî ne (*)
Sewdar û dildarê Edûlê ne.
Saldemin di bin sitemê de,
Çav pan nekirin (**) û pan nakin.
Wekîdinê, dilê min ï liyan e.

* * * *

Welatê min, jinebiya sedsalan,
Gelê min, sêwiyyê vê stêrkê,
Loma dilê min ï liyan e.

* * * *

T a n g i z i n

TORI

Carina tu têyî welat
Dibîyî agirek li ser dilê min
Ha ew e ko pê bişawitim.
Dibîyî pêlê deryayê carina
Bihêz, bilind
Têyî di qirika min de dirawestî
Ha ew e ko pê bigirîm.
Carina bi weşîyek tirih ra
Di nav libê hinarekê carina
Dibîyî xweşîya jiyanâ min
Min ji nû ve dijîyêni.
Dirabim, xwe diavêjim darî malê
Hêrişê didim ser tev bêdadîya
Bi qamçira bêbavîya digirim.
Lê hingî giran, hingî giranîn welat
Ha ew e ko bi wana bikevim.
Qîrînê didime dora xwe hingî
Rêz dikim tev sixêfîn ko dizanîm
Tif dikim rûwê nokera
Hûr û gir tev hevkarê xwînmija
Dilê xwe li wana sar dikim.....

(*) Dewrêşê Evdî, destaneka Kurdi ye. Dewrêş bi xwe gernasê wê yê serekîn e. Navê wî bi tenê nişana hestê netewî ye di navbera Kurdîn êzdî û yêñ misilman de, li dijî Çîl Ibramî Tirk. Evîna Dewrêş û Edûlê hêvanê destanê ye.

(**) Çavpankirin: qebûlkirina kêmâsiyê, çavquriçandina li ser bênamûsiyê.

K U R T E Ç İ R O K

S E D Ü Y E K A L Ü A L E K Ē

Şahînê Bekirê SOREKLÎ

Gul di destekî, ali di yê din de, sed û yek zarok, yek li dû yekî derbas bûn; û li ser perdeyeke mezin navên welatên wan yeko-yeko hatin xewan.

Yên mezin, ciwanan û mindalan li dora wan didane çepikan, ji yekî pêve, yê ku li navê welatê bav û diya xwe digeriya, li aleke ku têde roya zer li ser rengê gewrî sipî hatibuya çandin, lê dikir-ne dikir, nikaribû bidîta, ne aleke wisa, ne jî navekî yê di bîra wî da.

Ev zarokê dilxemgîn, tiştekî wî li dijîti alan tunebû, ne jî li dijî navên weltaan, lê dil dixwazt, ku bo xwe jî yekê bibîne û navekî, bo ew jî ji wan re bi dilgermî li çepikan xwe, wek zarokên din.

Di êvara wê rojê de zarok li mal nexwar şîv, ne jî bi dê û bavê xwe re keniya. Bav lê xeyidî û şande şetlê, lê xewa wî jî nema tê. Nîvê şevê hatibû, lawik hê payî bi çavên şil, dema dayik ket hindir û dest pêkir li ber bigere: "Kuro, lawo, çi bi te dada, çi hate serê te îroj, çi qewimiya?!. Hîske-hîska zarok rê nedida, bo ji dayika xwe re xuya ke, ka çima ew wisa digiriya.

Ji odaya din hat dengê bavê û di navbayê sar yê nîvê şevê de Keliya: "berde wî şelfûti, qîzê berde; bê terbiya ma canemerg li xerîbiyê, bê terbiya!!" Û mindal car din bi tenê ma, lihif kişand ser rûyê xwe û bi hêstiran şil û pil kir balgiyê xwe.

Dilê dayikê rûnenişt, pirr şewitiya û dîsa li kur vege riya, lihif rakir û ew hembêz kir. Dengekî nizim ji lêwik hat der û xwe gîhand guhêñ dayikê: "Çima bavo li min derew kir, çima?! îroj al û navên sed û yek welatan yeko-yeko derbas bûn li ber çavan. Ez geriyam û geriyam, li aleke ji alan, li navekî ji navan, bo em li hevûdin xwedî derkevin, lê ne al hebû di nav alan de, ne jî di navîna navan de nav. Çima we ez xapandim, çima?!".

Ji wê rojê û şûnve, ew zaroka bû yekî din, nema êdî rû da bavê, û dest pê kir ji xwe re li aleke din bigere, li navekî din ji navan; û rojeke ji ew rojêñ zivistanê, li ser berfa baxçekî ji yêñ Europa

mindalekî dida lotikan û ta ji dest dihat diqfîriya: "BIMRE BE-AL MAYIN. BIMRE BE-NAV MAYIN! Bo min jî nav û alek divêt, wek hevalên din!".


Sal bihurîn û rojek gihîst, ku bavê lêwik ji kerban nisañ ket, keserên kûr kişandin û dest bi gazincan kir: "Ev welatê bêbext ji min dizî zarokê min; wey li min reben û kukumê Xwedê, wey, wey!".

Qe nehat bîra bavikê ronedî, ku wî jî rojekê xwe ji bav û dayika xwe dizî û sondê vegera li welêt xwar ji xûşk û bran re, ji heval û hogiran re, lê nehat li hev hesabê mal û dukanê.

Di şeltê de dihat nalîna rêben, dema derî vebû ji nişkan ve: "BIST DU NOCH KRANK, VATI?" Hat dengekî biyanî. "Kurê wî" li halê wî dipirsî, cişare di nav lêvan de, bi Alemanî.

(V - 87)

(Ji pirtûka "Em û pirsa me")




WEŞANÊN NUH

NÊRGÎZA TORÎ

KAWA EFSANESİ



TÊKÖSER YAYINLARI



* İROJ PIRTÜKA EMÛ PIRSA ME
BIXWAZ:

Şandina bi balafirê(5-7roi) 15 Mark
Şandina bi gemî(7-11hefte) 10 Mark


Navnîşan:

WEŞANÊN CELADET BEDIR-XAN, SYDNEY
Box 905, Bankstown, 2200
AUSTRALIA.

A*NEKŞEBENDÎ

7 CİROK

1987



GIRTÎ

FIRAT CEWERÎ



DÎROKA KURDISTANÊ DÎ

- XI -

IV- Cîvaka kurdî (2)


3- Damezranê aborî

a) Koçeriya kurdî

Koçer, bi hêzanî, li dora êlê (eşîr) xwe pêk tînin (organize dîkin) û hema bitenê xwe didin xwedîkirina lawiran (heywan), di aboreke (iktisad) hinek girtî de. Jîna koçeran hişk e û di bin destelata (otorite) giran a serok de ye. Lî ev celeba jînê, ji bo sedemên hem civakî û hem aborî, ber bi guhertin û hundabûnê diçe. Li ser koçeriye û kartêkirinê (tesîr) wê li ser abora Kurdistanê, meriv dikare li van berheman binêre: J. Frölin, *Les formes de la vie pastorale en Turquie*, di Geografiska Annalen, Stockholm 1944, 219-72 de; H. Christoff, *Kurden und Armenier*, Hambourg 1935; O. L. Vilçevski, *Economie de la Communauté agraire nomade kurde de la Transcaucasie et des districts environnants dans la deuxième moitié du XIXe s.*, di SE, 1936, N° 4-5, 135-61 de; N. Bogdanova, *L'exploitation féodale des nomades*, di Arch. hist. Acad. Sc. URSS, II (1939) de; I. P. Petroushevsky, *Essai sur l'histoire des relations féodales en Azerbaïdjan et en Arménie, du XVIe au début du XIXe s.*, Leningrad 1949, 389; Wolf-Dieter Hüttneroth, *Bergnomaden und Yaylabauern im mittleren kurdischen Taurus*, Marburg 1959, 190; Thomas R. Stauffer, *The economies of nomadism in Iran*, di M.E.J., havîna 1965, 284-302 de; V. Monteuil, *Les tribus du Fars et la sédentarisation des nomades*, Paris-La Haye 1966; û X. de Planhol, *Les fondements géographiques de l'histoire de l'Islam*, Paris 1968, 442; H. Carrère d'Encausse, *Aperçu sur le problème du nomadisme au M-O*, di Doc. franç., Notes et Et. doc., 2095 (3-II-1955) de.

Tecrubeyêن gawastîkirinê (bicîhkirina koçeran) di navbera her du şerrêن cihanê de, di dewletêن cihê de ku tê de êlêن koçer

ên kurd yan ên din dijiyan, dest pê kir; lê hem li Tirkîyê û hem li Iranê, di dema Mustafa Kemal yan Riza Shah Pehlevî de, mêtodêن ku hatin bi kar anîn ne hergav ji aliye xelkê baş dihatin pejirandin (qebûl kirin), di vajayê (eks) Urîsan de li hemberî êlên Qefqasyê. Ew, dibêje R. J. M. Goold-Adams (Middle East Journey, London 1947, 95), ji herderêن Rojhilata Navîn bêtir serfiraz bûn; "bi rastî, awayê nêzîk-bûna wan ji vê pîrsê ji rêzanî (siyasî) û leşkerî bêtir bû... Ji bo ku wan ji koçeran re zewî (erd), av û şîretên mutexessîsên ziraî didan, ji bo ku ew karibin çinîyên xwe yên ku ji bo jîna wan pêwist bûn bêtir bikin". Li cihê din, gawestîkirin bê hişkî û bi gehînek (merhele), weka ji bo Cafan, çêbû.




(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin, fransizî-kurdî: Pervîn.

ANSİKLOPÊDİYA İSLAMÊ DE (*)

b) Gundîtiya kurdî

Gelheya kurdî bi hêzanî gundî ye. Anglo, Kurd di rêjeyeke (nisbet) fireh de (65-80%) gundî ye, li gel ku pîşewazî (sinaet) dest bi xuyabûnê dike. Eger rastî ewha be, em tê digihêjin ku zewî divê roleke bingehî di jîna gundî de bilîze. Lê sîstema malxweyiyê (mulkiyyet) li ba Kurdan gelek pirsan derdixîne. Heta şerrê cihanê yê yekemîn, Kurdistan, di beşa xwe ya mezintirîn de, di nav imperatoriya osmanî de bû, û sîstema malxweyiyê girêdayî zagona (qanûn) malxweyî ya osmanî bû (1858), ji bo ku zewiyên leşkerî di 1839 de hati bûn rakirin. Ev sîstem heta nêzîkî 1930, li welatên ku warisên (ji wiraset) imperatoriya osmanî bûn (Sûriye, Iraq), ajot (Warriner, 66). Ev zagon celebêñ cihê yêñ malxweyiyê dipejirand: "Mulk", di bin awayê mutlaq ê "reqaba" de, ku bi "senet tapo" yan bi "tasarruf" dihat pejirandin; malxweyîya Dewletê "mîrî", ku bi awakî mutlaq ji bo Dewletê ye, lê ku kes jî dikarin bi kar bînin "tasarruf"; malxweyîyan "Waqf" yan "xeyrî", eger xwediyyê karê wan sazendeyên (muessese) xeyrî bin: Mizgeft, dibistan yan xwendekar, nexweşxane, yan "ehlî" eger temenê (imr) xwediyyê karêñ wan piçûk be; hebûnên giştî ku herkes wan bi kar tîne, weka rê, çem, aqarêñ gund û hwd.; di dawiyê de, hebûnên mirî "mewat", zewiyên çolî û vala ku hemî hebûnên (mulk) Dewletê ne. Li Iranê, divê ku hebûnên "xalisa" yan yêñ Tacê bêñ ragihandin (ilawe kirin) (Lambton, 238-58).

Firehbûna van celebêñ cihê yêñ malxweyiyê di nav welatan de diguhere û bi awakî giştî cihekî piçûk ji malxweyîn piçûk re dihêie (2/3 gelheya gundî li Tirkiyê, 1/4 li Iraqê). Li herderî malxweyîya mezin hikm dike. Li Iraqê, ji 10 milyon hêktarên zewiyên cotê 4 milyon ên Dewletê ne û 6 milyon ên malxweyîn arizî (xusûsî) ne. Li Iranê, 10% ji gundiyan xwediyyê 8% ji zewiyân in, ango ji 1 heta 3 hêktar yan "cot" ji bo malbatekê. Rêzayê (mana) "cot" di eyñî zemanî de cotê gayêñ ku ji bo cot bi kar têñ yan karê ku gundî di rojekê de dike ye (Qasimlû, 128). Malxweyîn mezin, ango Dewlet, serokên êlan, şêx, bazarganên mezin, ji bo demeke kurt zewiyên pirr mezin bi perekî ku rewşa gundî pirr teng dike didin kirê. Bi rastî, bac (vergi) pirr giran in. Eger li Iranê hatina salî ya malxweyîn mezin digihêje 5.600 dolar ji bo



merivekî, ya gundiyyê navîn digihêje bitenê 60 dolar (Qasimlû, 168). Li Iraqê, berê şerrê cihanê yê duyemîn, hatina gundiyyê kurd digihajt 6 heta 10 L. di salê de (Xosbak). Ev bacêñ ku bi tiştêñ tebîî yan bi karê bê pere (80%), bi pere (15%) û yêñ mayî (5%) ku têñ dayîn ji gundî re gelek giran têñ. Li Tirkiyê, sîstêmêñ cihê hene: "Yaricilik" ku tê de gundî destgeha (alet) xwe bixwe, darê cotê û dewar, bi kar tîne û nîvê çiniyê dide; "resimcilik" ku tê de bilindbûna kirê girêdayî rewş û dewlemendiya zewî, karker, hatina çiniyê û pileya (derece) bindestiya gundî ye; "murabba-cilik" ku tê de, li hemberî karê xwe, gundi bitenê 1/4 çiniyê distîne (Mûseyêv, 13). Li Iranê, meriv van koletiyan bixwe di bin nav û sîstêmêñ nêzîkî wan-de dibîne: "Nime-kare" ku tê de malxwe zewiyê avî dide kirê, toxum dide û gundî karê xwe dide: Malxwe 3/5 çiniyê distîne û gundî 2/5 wê ji xwe re dihêle; "sêykbar" ku tê de malxwe zewî, av, toxum û dewarêñ cotê dide û 1/3 çiniyê distîne; "sêqut" ku tê de malxwe zewî û av dide û 2/3 çiniyê distîne; "dawudu" ku tê de malxwe, li hemberî zewî û toxum, 2/10 çiniyê distîne (Qasimlû, 132-8). Li Kurdistana Iraqê, ev pirs bixwe têñ dîtin. Bi vî awayî, ji bo çiniyên havînî, tütin û pembû, malxwe 1/2 û ji bo birinc 1/3 distîne; ji bo çiniyên zivistannî, genîm yan ceh, ew 1/10 yan 1/5 distîne. Ev ji derveyî deyn yan bac e: 7,5% ji bo "serkal" (merivê malxwe), 10% ji bo hikû-

'metê û bi ser de jî tiştên ji bo "qehweçiyê" malxwe, "mudhif" (oda mîvanan) û hwd. (Xosbak, 48). Bi vî awayî, li gundêñ êl-rakirî ku di bin destê malxweyan de ne, hatina zewî, bi awakî giştî, ewha tê par kirin: 3/6 ji bo malxwe, 1/6 ji bo nûnerê wî (ji bo ku malxwe tucar li wira najîn, lê li bajaran rûdinêñ), 1/6 ji bo merivê ku zewiyan idare dike û 1/6 ji bo karkerê ziraî ku ne zewî û ne dewarê wî, lê bitenê milêñ wî hene. Ango, di dawiyê de, di dawiya salê de, gundiyan piçûk ê kurd dest-vala û tije deyn dimîne (Rossi, 86), ji bo ku ew piraniya caran neçar (mecbûr) dibe ku bi riya simsaran derbas bibe ku karibe heta çiniya wêbê li piya raweste.

Eger mercên (şert) jîna gundiyan kurd ev bin, meriv dikare tê bigihêje serhildanêñ gundiyan ku carcaran çêdibûn, weka ya Murûdan, ên Çiyayê Kurdan (Sûriye), di bin serokatiya İbrahim Xelîl de, di navbera 1930 û 1940 de (li Th. Bois, Les Kurdes, 15-115 binêñ) û serhildana 20.000 malbatêñ Dizaî, di 1954 de, ku nizmkirina bacê heta 1/20 çiniyê, rakirina karê bizar û diyariyan bi hinceta (munasebet) cêjn û dawetan dixwestin (Gavan, 19).

